Fêrbîn u Fêrkirin ya Zimanê

"**Çîrokêt Serhatî**" ders yêt fêrbîna zimanê ye bu dû yan pitir miruv. Dê harî karîa te kin da tu fêr bî u zîrek bî bu axiftinê u nivîsandinê u xwandinê. Ev ders xuş in!

Husa Çîrokêt Serhatî bike:

Tiştekê bike.

1. Serhatîekê ji perê bêt hilbijêre yan tiştek dî bike.
2. Serhatîê li gel mamostayê xu yan xwîndikarê(êt) xu bike.

Biaxive.

3. Beẖsa serhatîa xu bike. Bêje ve çi lê hatî. Pisîar bike, "Ewilî me çi kir? U paşî çi çê bî?"

Binvîse.

4. Çîrokê piç piç binvîse. Heker pêtivî ye, mamostayê zimanê dişêt axiftina xwîndikarê dirist bike. Bêje mamostayê, "Ez dê nivîsim."

   Heker tu mamosta î u ẖemî xwîndikarêt te ne şên baş binvîsin, rista binvîse li texta reş wextê xwîndikarêt te dibêjine te çi binvîse.

   Heker tu xwîndikarek î bi tinê fêr dibî, bu xu çîrokê binvîse.
5. Demê tu çîrokê dinivîsî, pisîar bike heker tu tiştekê tê nagehî. Bêje, "Çawa? Ez tê ne geheştim."

Bixwîne. Xeletîa xu dirist bike.

6. Heker te ẖemî nivîsî, xwîndikar pêtivî ye çîrokê bu mamostayê bixwîne ve. H̱emî xeletîa dirist bike u carek dî binvîse. Bêje mamostayê, "Ez dê nuke bu te xwînim ve. Zeẖmet ne bit bêje min heker min xelet nivîsî."

Binvîse.

7. Heker xwîndikar ne nivîsî ne bu xu, bila ew pêtivî ye çîrokê ji textê reş çap bikinc li ser perê xu binvîsin.

Bixwîne.

8. Xwîndikar carek dî çîrokê bi dengekê bilind bixwînit. Pêtivî ye mamosta axiftina wan dirist bikit.
9. Mamosta hindek peyv ji çîrokê dibêjit u xwîndikar nîşan dikit. Mamosta dibêjit, "Ka <dihî> [peyvek li çîrokê]." yan "Ya <dihî> nîşa min bide." Xwîndikar wê peyvê nîşa mamostayê didit.

ABC Pît bike.

10. Xwîndikar çîrokê seẖ nakin. Mamosta hindek peyv ji çîrokê dibêjit u xwîndikar wê peyvê dinivîsit da fêrî pîtkirinê bibit. Piştî 5-10 peyv nivîsî ne, xwîndikar çîrokê seẖ dikit u pîtkirna xu dirist dikit. Pêtivî ye ẖemî xeletîa xu dirist bikit u carek dî binvîsit.

Bixwîne. Binvîse. Biaxive.

11. Carek dî xwîndikar çîrokê bu hevalekê xu dinivîsit. U heker divêt, dişêt carek dî ẖemî çîrokê binvîsit. U bê xwandin ew dişêt çîrokê bêjit.

© 2007 by Şirîn

© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

Xwarin

- ❑ Çayê yan qehweî çêke. Pêk ve vexwe.
- ❑ Pêk ve zad bixwe.
- ❑ Herre seyranê di gel hevalêt xu.
- ❑ Sendewiç yan piskuêt çêke.
- ❑ Kêkekê yan şerbeteka fêqîê pêk ve çêke.
- ❑ Seyranekê bu xu deynin.
- ❑ Cihê xwarnê hazir bike.
- ❑ Herrin xwaringehê u fravînê pêk ve bixwin.
- ❑ Herrin çayêxanê yan gazînûê.

Tiştêt Kaẅezekê

- ❑ Rismî çêkin yan reng bikin.
- ❑ "Texmînê Bike!" yarî bikin.
- ❑ Rismê xêzana çêke u navêt ẅemîa binvîse.
- ❑ Firukêt kaẅezê çêke u bifirre.
- ❑ Tarîxêt teybet li riznamê nîşan bike u beẅsa bike.
- ❑ Çîrokekê bêje u rismêt çîrokê bihijmêre.
- ❑ Mektubekê bu hevalê xu binvîse.
- ❑ Tiştekê bu Kurdî yan Inglîzî tercime bike.

Keskatî

- ❑ Pîa herrin.
- ❑ Ẅecku tu birînekê der bikî.
- ❑ Ẅecku tu dixtur î. Beẅsa nesaxîa hevala xu bike.
- ❑ Herrin cihê seyranê u risma bigirin.
- ❑ Keskatîa biçînin.

Bajêrr

- ❑ Ẅecku tu pareêt xu bikî di banqê da.
- ❑ Ẅecku tu pareêt xu serif bikî.
- ❑ Ẅecku tu bu şulekê nî lê pirsî.
- ❑ Ẅecku tu diçî teksîê.
- ❑ Cilkêt biçîk bizivirrînin.
- ❑ Pêk ve herrin mala cîranêt xu.
- ❑ Herrin bu xu bajêrrî bibînin. Risma bigirin.
- ❑ Herrin metẅefê. Risma bigirin.
- ❑ Ẅecku tu pirrça êkê biqosînî.
- ❑ Seẅ kin xerrîta bajêrrî u fêr bikin hîn çawa dê çin hindek ciha.
- ❑ Seẅ kin xerrîta Emrîke u hilbijêrin hindek bajêrra da biçin. Hilbijêrin hîn dê çin kîşk rêkê.
- ❑ Pêk ve herrin dawetê.

Cilik

- ❑ Cilkêt xu lêk bide bi demê salê, şikilê, rengê ….
- ❑ Qemselê yan pêlava yan … bikin ber xu. Bêxin.
- ❑ Yarî bikin: Biha yêt wan texmîn bike.
- ❑ Pisîara hevalêt xu yê bîanî, "Cilkêt dawetê nîşa min bide."

Paqijkirin

- ❑ Pêk ve mala xu paqij bikin.
- ❑ Amana bişun. Deynin cihê wan.
- ❑ Harî karîa hevalê xu bike li paqijkirna biharê.
- ❑ Duhinê timbêla xu biguhurrin.
- ❑ Feẅsa tiştêt duhinî u tayerêt timbêla xu bikin.
- ❑ Cerrîfkê kehrebê paqij bikin u pencerka bişun.
- ❑ Timbêla xu bişun.

Yarî

- ❑ Yarîa biçîka bike.
- ❑ Bêje, "Min tiştekê şîn dît." Hevalê te dibêjite te ew çi ye.
- ❑ Kukanê yan yarîek dî bike.
- ❑ Zarî bike (şulê, çîrokê …). Hevalê te dibêjite te ew çi ye.
- ❑ Qedemê yan taîre yan tepka destî lê bide.
- ❑ Pezila bêxin pêk ve.

Dikan

- ❑ Pêk ve herrin dikanê. Hindek tişta bikirrin.
- ❑ Pêk ve herrin sîkê xwarinê.
- ❑ Pêk ve dîarîekê bu cîranê xu yan biçîkêt birayê xu bikirrin.
- ❑ Pêk ve herrin sîkê gundî.
- ❑ Pêk ve hindek cilka bikirrin.
- ❑ Pêk ve hindek tiştêt kehrebê bikirrin.

Çêkirin

- ❑ Xemilandinekê cejinê çêkin.
- ❑ Dijdaşa yan balîfka yan melîtka ker kin.
- ❑ Balîfka yan betenîa yan xewlîka bidrîn.
- ❑ Guharrtina gula çêkin.
- ❑ Xanîê xwarina teyra çêkin.
- ❑ Komedîna kitêba yan mekteba çêkin.
- ❑ Komedîna pêlava yan cihê l'abika çêkin.

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.